

## Dermanekî nû ji bo jidestana giraniyê, ezmûnên xwe yê dawîn derbas dike

Li gor rojnama Emerîkî “Healthy Daily News – Nûçeyên Rojane yê Tendurustî”, dermanekî nû bi navê LORKASÊRÎN, di ezmûnanê de ye, ew derman encamine hêvîbar ji bo kêmkirina giraniya mirov diyar dike. Lêkolîvan hêvî dikin, ku ew dermanê dê bibe çekeke nû li hember pirsgirêka qelewbûnê ya ku li seranserî cîhanê peyda bûye.

Gewretirî  
n zanyarên  
Kompaniya  
Arîna ji bo  
pêşesakirina  
dermanan li  
Bajarê  
Sandiyêgo –  
Emerîka



dibêjin, di lêkolîna ku li ser wî dermanî hatiye kirin de û bê ku parêzî û werziş werin bikaranîn, giraniya mirovên ku ew derman bikar anîne zû dageriyaye.

Lêkolîn dibêje, 469 jin û mêrên ku nîşana girsiya govdeyên wan di navbera 30î û 45an de bû, xwe xistin bin lêkolîn, ew kes li gor tibaba dermanê ku dibirin parve çar koman bûn, komek jê xapînek bû. Di encama ezmûnê de diyar bû ku giraniya wan bi radeke pir baş daket. Pîvana nava wan û tibaba Kolîstrol jî di xwînê de daket.

Nûçe dibêje ku ew derman derbas pêngava ezmûnî ya sisiyan bûye, û eger ew wê pêngavê jî derbas bike, kompaniya dê daxwaznamekê pêşkêş Kargêriya Derman û Xwarinê ya Emerîkî bike daku wî wek dermanekî nû tomar bike.

Rapora rojnamê dibêje ku pêdvîyeke îjîdil bi “çekek nû” ji bo bergiriya rûdawa qelewbûnê heye, ku dusêyek ji gelê Emerîkê toşê bûne. Wek tê zanin, ew qelewbûn jî, pêşepirsine tendurustî yê giran çê dike, jê janên dil, ziwabûna xwînberan, celta û cureyê diduyan ji jana Şêkir.

Erê bikaranîna bernameke parêziyê û rahênanên werzişî jî kanin qelewbûnê ko bikin. Lê, pir hindik ji kesan kanin wan guhertinan biparêzin û nehêlin ew giraniya ku jidest dane vegere. Ji bilî ku hin dermanên ku roja îro ji bo jidestana giraniyê bikar tên, hinek ziyane xwe yê naskirî hene. CNN

### Dumahîk: Behîname

a Kurd li Sûriyê re û ji xwe re – weke Rêxistina Ewropa ya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê – dibêjin: bila cihê rehmetî Buhuşt be û serkeftin jî ya doza me ya netewî û demokrat be. Û dixwazin bînin bîra me tevan ku xwedîderketina li xebatkar û nemiran tenê bi xwedîderketina li bawerî û bîrdozên wan dibe. Loma jî ji me hemû heval û hevriyên nemir têtê xwestin ku em rojekê zûtir li xwe vegerin, berjewendiyên bilind yê gel û tevgera xwe di ser hertiştêkî din re bigrin, da ku em hemû bi hev re kari bin yekîtiya Têvgera Kurd û avakirina lêvegereke kurdî di demeke nêzîk de ji gelê xwe re, ji xebtkarên zindî û ji şehîdên xwe re bikin mizgîn. Ev berpîrsiyariyeke me li hember gel û nemirên me ye. Tenê bi vê yekê em dikarin xebata xwe ya li pênavî avakirina sûriyeke demokrat, ku tê de hemû mafên netewî yê gelê me bêne bidestxistin, xurt û berhemdartir bikin.

Li dawiyê em, weke Rêxistina Ewropa ya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê careke din sersaxiyê ji malbata wî, partiya wî, tevgera kurdî û tevaya gelê Kurd re hêvî dikin û dibêjin: Bila cihê wî her Buhuşt be. Serkeftin jî helbet dût an nêzîk ya doza gelê me ya netewî, demokrat, rewa û dadmend e.

**Komîteya Serkirdayetiya Rêxistina Ewropa ya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê - Yekîti**